
Bê dirav e

# MIZGÎN

Hejmara 176

15- ÇILE 2025



# Naverok


Wênesazî

Wêjeya Zarokan

Lîsk

Welatê me

Tu dizanî

Tendirustî

Tîp û gotin

Navdar

Bexçeyê Navan

Jîngeh mala me ye

Jêhatiyên Zarokan

çîrok

Bixwînin û fêr bibin

Wêne û tablo



Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Şêwekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Cîhan Isma'îl
Baran zagros

Sererastkirina Erebî
Abdulah Rehîl

Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim


Wergera Sûryanî
Calînos Yûsif
îsa


Dîzayn
Mjed ALsadun

Her 15 rojan carekê Kovara Mizgîn ya zarokan ji
hêla saziya Ronahî ve tê derxistin

Rengkirina wêneya malbata bextewar weke di tabloyê de temam bike

أكمِلْ تلوينَ صورةِ الأسرةِ السّعيدةِ كما في الّلوحةِ





# XWÎŞKA GULÎPENG

Xwîşka mina gulîpeng
Şimamoka şox û şeng
Xeml û xal û reng û reng
Devbiken û şîrîndeng
Bi lîstik û bi yarî
Bo dayîkê diyarî
Serê sibê bi maçan
Dibê rojbaş dayê can
Paşê dişû dev û dan
Berî bixwe çêşt û nan
Piştî taştê dike noş
Pir bi keyf û xur coş
Bi pênûs û pirtûka
Di gel komek zaroka
Bi lez diçe dibistan
Dibistana Kurdistan

Diyar Bohtî

# Werin hevalno em lîstika mamikan bilîzin

# تعالَوا أصدقائي نجرِّبُ لعبةَ الألغازِ



Tişteke çar lingên wî hene lê nameşe, çi ye?

ما الشَّيءُ الذي لديه أربعُ أرجلٍ، ولا يمشِي؟

Tiştê ku di tevahiya rojê de rengê xwe diguherîne, çi ye?

مَا الشَّيءُ، الذي يتغيّرُ لونُهُ طوالَ اليومِ؟




# Keleha Necim

# قلعةُ نجمٍ

Keleha Necim ya dîrokî li rojhilatê bajarê Minbicê, 30 km dûrî rexê rastê yê çemê Firatê ye. Ew xwedî cihekî stratejîke û li ser rêya bazirganiya cîhanî ya kevnar ya bi navê rêya Herîrê ye. Keleha Necim şêwazeke wê ya mîmarî ya taybet heye, dişibe Keleha Helebê. Ew deriyê ketin û derbasbûna ji welatê Şamê ber bi Mezopotamyayê ve ye. Ew yekane tiştê herî bisêr li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye ku heta astekê bedewbûn û şêwaza xwe ya mîmarî parastî ye. Ew bi gelehan, birc û cihên dîrokî dorpêçkirî ye.

تقعُ قلعةُ نجمٍ الأثريَّةُ شرقَ مدينةِ منبجَ على بعدِ ثلاثين كيلو متراً على ضفَّةِ نهرِ الفراتِ اليُمنى، وتتميَّزُ بموقعِها الاستراتيجيِّ على طرقِ التِّجارةِ العالميَّةِ القديمةِ، طريقُ الحريرِ، ولها طِرازٌ معماريٌّ مميَّزٌ، تُشبِه قلعةَ حلبَ، وهِيَ بوَّابةُ الدُّخولِ والعبورِ من بلادِ الشَّامِ إلى بلادِ ما بينَ النَّهرينِ، وهي الآبِدةُ الوحيدةُ في شمالِ شرقِ سوريا، الَّتي مازالتْ نوعاً ما محافظةً على روعتِها، وطرازِها المعماريِّ، وهي مُحاطةٌ بقلاعٍ، وحصونٍ ومواقعَ أثريَّةٍ كثيرةٍ.



# Tu dizanî?
# هل تعلم؟



**Dar gaza kerbonoksaydê dikşînin û gaza oksejînê ya pêwîst ji bêhindayîna mirovan, hildbirîne. Her darek dikare oksijîna pêwîst ya rojekê ji çar mirovan re hilbirîne.**
**-Perperîk nikare bi rêya zimanê xwe çêja xwarinê nas bike, lê ji bo çêjkirina şînatiyên ku li ser wan disekine, lingên xwe bikar tîne.**

أنَّ الأشجارَ تمتصُّ غازَ ثاني أكسيد الكربون، وتنتجُ الأوكسجينَ، الذي نتنفَّسُه. شجرةٌ واحدة يمكن أن توفِّرَ الأوكسجين لأربعةِ أشخاصٍ في يومٍ واحدٍ!
-أنَّ الفَراشةَ لا تستطيعُ تذوُّقَ الطَّعامَ بلسانِه، بل تستخدمُ قدمَيها لتذوُّق النباتاتِ، التي تقفُ عليها!

# Piroteîn fîmara masûlkeyan e

# البرُوتيناتُ: غذاءُ العضلاتِ




HEVALÊN MIZGÎN, HÛN XEYAL DIKIN KU BIBIN BIHÊZ WEKÎ JÎR Û LEHENGAN? HÛN DIKARIN BI ALÎKARIYA XWARINA


أصدقاءَ مزكِينَ هل تَحلَمون أنْ تصبحوا أقوياءَ مثل الأبطال والأذكياء؟ يُمكنكم ذلك بمَساعدةِ الأطعمةِ.

KU PROTEÎNÊ DIHEWÎNE WEKÎ HÊK, GOŞT Û ŞÎR WIHA BIN. PIROTÎN ALÎKARIYA LAŞÊ WE DIKE JI BO KU MEZIN BIBE Û MASÛLKEYAN AVA DIKE. JI BER VÊ YEKÊ,

الّتي تِحوي على "البروتينات"، مثلُ البيضِ، واللحومِ، والحليبِ. البروتيناتُ تساعدُ جسمَكَ على النمو، وبناءُ العضلاتِ؛ لذا، تناوَل البروتينات، وستَكونُون في كامل النمُوّ القوِيّ، وأذكياءَ في المدرسةِ.



**Hevalên hêja, tîpên kêm temam bikin; ji bo ku hûn navan li gorî wêneyên wan temam bikin.**



# Bese Xanim

# بسة خانم



Ew lehengeke kurd e, di têkoşîna li dijî zordariyê pêşengiya jinan dikir. Ew bi rihê berxwedanî, welatparêzî û fedekariyê hate naskirin, heya ku jiyana wê bû destane û ji nifşên nû re dihat vegotin. Ew hevjîna serokê şoreşa Dêrsimê Seyid Riza bû. Wê berxwedanî wekî şerê azadiya xwe dihesiband, çarenûsa xwe bi çarenûsa gelê xwe ve girê dida. Di şoreşa Dêrsimê de li dijî dagirkeriya Tirk berxwdanî kir heta ku şehîd bû û di dîroka Kurdistanê de bû sembol.

كانتْ بطلةً تقودُ النِّساءَ ضد ظلم الأعداء، وتتميَّزُ بروحِ المقاومة، والوطنية والفداءِ، حتى أصبحت سيرة حياتها ملحمةً، تُروَى للأجيالِ. وهي زوجةُ قائدِ ثورة "ديرسم" الشَّيخ سيد رضا. هيَ تعدُّ المقاومةَ حرباً لأجل حرِّيتها، فربطَت مصيرَها بمصير شعبها، وأدركَت أنْ لا حريةَ لها دون تحرُّرِ شعبها. فقد قاومتْ العدوَّ التركيَّ أثناءَ انتفاضةِ ديرسمَ، حتى استشهدتْ، وأصبحتْ رمزًا في تاريخِ كردستانَ.

# Hin Navên bi tîpa -Ç

Çeleng

Çetîn

Çiya

Çekdar

Çinar

Çiyajîn

Çîmen

Çavşîn

# Pilastîk û bikaranînên wê

# البلاستيكُ واستخداماتُه



أصدقائي، تعالَوا لنجرِّبَ، كيف نقضي يومنَا دون استخِدامِ البلاستيكِ، فهلْ نستطيعُ ذلكَ؟ البلاستيكُ يمَكن أن يضرَّ البيئةَ، إذا لم يُستخدَم بحكمةٍ ومعرفةٍ. لنجرّبِ استخدامَ أكياسِ القُماش بشكلٍ متكرَّر بدلًا من أكياسِ البلاستيكِ، أو زجاجةِ ماءٍ قابلةٍ لإعادةِ الاستخدامِ بدلًا من قَوارير البلاستيك. لنحاولَ معًا أن نخَصِّصَ يومًا لا نستعمل فيه البلاستيك؛ فيومٍ خالٍ من استعمال البلاستيكِ، يعني بيئةً أنظفَ، وأكثرَ صِحَّةً!

Hevalno werin em hewil bidin ku roja xwe beyî bikaranîna plastîkan derbas bikin. Gelo em ê bikaribin? Ger plastîk bi aqlane û zanebûn neyên bikaranîn, dibe ku zirarê bide jîngehê. Werin em çendî caran biceribînin ku li şûna kîsên naylon, kîsên ji caw bikarbînin. Herwiha li şûna şûşeyên avê yên plastîk, şûşeyên ku dibe careke din bên bikaranîn, bikar bînin. Ka em hewil bidin rojekê destnîşan bikin ku tê de plastîkan bikarneynin, ev tê wateya jîngehek paqijtir û tendirustir.!

Hevalno ka em nas bikin bê hûn çawa di werzê zivistanê de xwe ji nexweşiyan diparêzin.

أصدقائي لنتعرفْ على حسن تصرُّفكم، وكيفية وقايةِ أنفسِكم من الأمراضِ في فصل الشِّتاءِ.



Hesen Mûsa Derbo:
Ez ji kesên nexweş dûrdikevim û ji bo parastina xwe maskan datînim.

حسن موسى دربو:
أتجنَّبُ مُخالطة المرضى، وأضعُ كمَّامة؛ لأحمِي نفسي من العدوى.



Xensa Xesan Mislit:
Ez cilên gerim yên guncaw ji vê werzî re li xwe dikim.

خنساء غسان مسلط:
ألبسُ الملابسَ الدَّافئة، والمناسبة في هذا الجوِّ البارد.



Mehmûd Mihemed Aldendel:
Ez ji xwarinên ne tendirust û ava sar dûrdikevim.

محمود محمد الدندل:
أبتعدُ عن المأكولاتِ غيرِ الصِّحّيةِ، والماءِ البارِد.

## Çîroka : destên xêrxwaz



Sîla û Mîdo serdana bapîrê xwe yê nexweş kirin û eniya wî maç kirin


Sîla: Bapîrê min kuxika te xurte, pêwîstiya te bi hingiv heye.

Bapîr: Neviya min ya hêja, ez pir hewcedarê wê me, lê peyda nabe, ji min re hat gotin ku qiralgeha mêşên hingiv nema hingiv hildibrînin.


Sîla: Dapîrê min ez û birayê xwe Mîdo em ê biçin qiralgeha mêşên hingiv.

Li çem û newalan geriyan û bi çiyayan ve hilkişiyan heta ku qiralgeha mêşên hingiv dîtin.







Ji aliyê padîşaha qiralgehê ve bi germî hatin pêşwazîkirin.
Hûn bixêrhatin fereşteyên biçûk, hûn çawa hatin vî welatê dûr?
Sîla: Dapîrê min nexweşe û dermanî wî higiv e.
Padîşaha mêşên hingiv: Ma ez ê çavtengiya we bikim, lê li xemgîniya mêşan binêrin, pirsgirêk di gul û kulîlkan de ye ku seqem girtine û em nema dikarin hingiv hilbirînin.
Sîla: Ez ê qiralgeha gul û kulîlikan li ku bibînim?
Padîşaha mêşên hingiv: Piştî çemê hêviyê bi heft çiyayan tê qiralgeha gul û kulîlikan bibîne.
Ewqas dûrbûn derbas kirin bêyî ku bitirsin yan aciz bibin ji bo ku bighêjin qiralgeha kulîlikan.
Sîla: Em gihiştin, binêre Mîdo em gihiştin.
Nêzî qiralgeha kulîlikan bûn
Mîdo: Roj baş ji xweşktirîn qiralgehê re



Kulîlk: Roj baş, çima hûn hatine qiralgeha me?
Sîla: Bapîrê min nexweşe, dermanê wî jî hingive.
Em çûn qiralgeha mêşên hingiv, ji me re gotin ku tu dikarî şîrazê bide mêşên hingiv, da ku hingiv bidin me û bapîrê min bixwe û şîfa bibe.
Kulîlk: Em kulîlikên hişkin, bê reng û bê bêhin in, em nikarin şîraz û bîna xweş hilbirînin, bi avê em dijîn û dermanê me av e. Ji çem û ewran bipirsin, çareserî li gel wan e.
Qiralgeha kulîlikan hiştin û bi hêviya dîtina qiralgeha çemê Şîn yê mezin ketin rê. Di rê de pirsa çemê Şîn ji lawir û firinideyan kirin, heta ku çem dîtin.
Sîla: Çemê bedew, em alîkariya te dixwazin.
Çem: Ez tu carî çavtengiyê nakim, lê ez bê av im. Heta ku ez avê bidim pêwîste hûn qiralgeha morîyan bibînin, bela vê axê û zuxiran li ser min rakin da ku av bihrike û jiyana me vegere.
Berê xwe dan qiralgeha morîyan
Mîdo: Sîla li wan malan binêre, ew malên morîyan in, dê lez bike.
Sîla: Padîşaha morîyan, em dixwazin tu alîkariya çem bikî, ax û zixuran li ser rakî da ku av biherike ji bo kulîlikan, kulîlik şîrazê hilbirînin, mêşên hingiv jî bên û hingiv hilbirînin û bidin me ji bo bapîrê me yê nexweş.



Padîşaha morîyan: Ez dixwazim alîkariyê bikim lê pêwîstiya me jî bi alîkariyê heye, ji ber ku hêza me lawaz bûye û yê hêzê dide me libikên genim yên weşiyayî ne.
Sîla û Mîdo spasiya padîşaha morîyan kir û soza alîkariyê dan.
Ji bo dîtina zeviyê genim ketin rê
Mîdo: Wane zeviyên genim, binêrê simbilên wan piranî vala ne, ka em ji wan bipirsin.
Sîla: Libikên genim yên bedew, bapîrê min nexweşe, alîkariya morîyan bikin da ku morî alîkariya çem bikin, çem jî alîkariya kulîlkan bike, kulîlik alîkariya mêşên hingiv bikin û mêşên hingiv alîkariya bapîrê min yê nexweş bikin.



Libikê genim: Em dixwazin alîkariyê bikin, lê em pir biçûk û zeyîfin. Cotkar em paşguh kirine û semada ji me re pêwîst nedan me, ji ber wê em nikarin xwarinê bidin morîyan.
Herin cem cotkar da alîkariya min bike û ez jî alîkariya morîyan bikim.
Xatir ji libikên genim xwestin û ji bo dîtina cotkar ketin rê.
Mîdo: Binêre sîla ev tevrekî avêtî ye.
Sîla: Ka cotkar ez wî nabînim.
Mîdo: Wa ew li bin siya darê razayî ye.
Nêzî wî bûn û silav danê
Cotkar: Li ser çavan hûn hatine, çima hûn hatine vir?
Sîla: Em û tu destên xêrxwaziyê ne, were em guh bidin zeviyên genim yê ku wê bihêle morî jiyan bikin û bihêz bibin, morî jî wê alîkariya çem bikin, ava çem wê bi ber kulîlikan ve biherike. Kulîlik jî wê şîrazê bidin mêşên hingiv û hingiv bê hilbirandin, dapîrê min jî wê hingiv bixwe û şîfa bibe.
Cotkar: Ez ê kêfxweşbim, ez li ser zexeliya xwe  lêborînê ji we û ji xwzayê dixwazim.
Sîla: Destên xêrxwaz tenê ji bo xêrxwaziyê ne. Çiqas tu dstên xwe ji bo xêrê dirêj bike wê xêr ji bo mirov û lawiran pirtir bibe.
Mîdo û Sîla bi kêfxweşî vegeriyan mala bapîrê xwe û qotiya hingiv bi wan re ye

Mîdo: Bapîrê min, me ji te re hingiv anî.
Bapîr piştî ku hingiv xwar: Neviyên min yên hêja, herdem bibin destên xêrxwaziyê, qenciyê pêşkêşî xelkê bikin. Ji ber ku hezkirina xêrê ji baweriyê ye.



Qertel

نَسْرٌ

Eagle



Tawûs

طَاوُوسٌ

Peacock



Çûk

عُصْفُورٌ

Bird



Qijik

غُرَابٌ

Crow

# مزكين

مجاناً

العدد
176
15 - كانون الثاني
2025

